

Fîlma av û hewayê > [Lêkolîna av û hewayê](#)

Em di lêkolînên av û hewayê da ji gellekê warên pispor agahiyan werdigirin, wek mînak, agahiyên li bara guherînên di asta CO2`yê li atmosferê da û her wiha şiyana deryayê bo vekişandina CO2`yê. Ji bo bidestana kurteyeka têkûz, Panela Navdewletî ya Rêxistina Neteweyê Yekbûyî li bara Guherîna Av û Hewayê-IPCC(Panela NY ya Av û Hewayê) ev agahî kirine raporên dirêj sa ku ji siyasetmedaran ra ew bingeh hebe ku li ser wê li bara siyaseta av û hewayê biryarê bidin. Di karê diyarkirina vê yekê ku guherîna av û hewayê dê di çend sedsalan da reftar bike, lêkolînerên av û hewayê mînakên av û hewayê bi kar tînin. Lê, çendîn hokarên azmûnkî di mînakên av û hewayê da hene ku jê endazeya çêbûna gazan di pêşerojê da heye. Lewma, meriv nikare pêşbîniya av û hewayê giştî têkûz diyar bike. Em ê hemberî hokara nediyarbûnê li lêkolînên av û hewayê da çawan reftar bikin? Gelo em dikarin baweriya xwe bi nîşaneyên pêşgotinên lêkolîneran bikin? Gelo panela NY li bara av û hewayê herdem rast dibêje?


Beriya ku hûn fîlmê bibînin, karên ku hûn gerek bikin ev in:

1. Hûn li bara panela NY bo av û hewayê çi dizanin?
2. Li gorî we, lêkolîner çawan pêbaweriya kalîte/çawaniya karên xwe ê yên kesên din misoger dikin?
3. Di medyayan da bi awayekî berfireh li ser av û hewayê tê axaftin. Kîjan sermijara taybet zêdetir balê dikişîne?

Erk û karên têkildarî fîlmê:

1. Di salên 1950`yê da, zanyarekî amerîkî bi navê Çarlz Dêyvîd Kîlîng bo endazegritina asta CO2`yê li atmosferê da amûrek danî li quntara çiyayê Maona Loa li Hawaiiê ku ji hemî çavkaniyên gemarê bi dûr be. Çima ew ji çavkaniyên gemarê bi dûr bû û wan endazegirtinan çî encam diyar kirin?
2. Endazegirtin li nava gellek tiştan da nîşan didin ku guherînên berbiçav ên demsalî li asta CO2`yê li atmosferê da hene. Li gorî we sebaba van guherînên

demsalî çî ye?



3. Gelo derya dikare bo kêmkirina asta CO₂ `yê li atmosferê arîkar be?
4. Panela NY bo av û hewayê çawan rastiya kalîte/çawaniyê misoger dike û ew li bara lêkolînên av û hewayê li derve çawan ragihandinê dike?
5. Panela NY bo av û hewayê senariyoyek amade kiriye ku rêbazekê diyar dike ku civak jî dikare geşe pê bide. Çima Panela NY bo av û hewayê çendîn senariyo amade kirine? Gelo yek têr nake?
6. Çima pêdiviya me bi senariyoyekê heye?
7. Model û mînakeka av û hewayê çî ye?
8. Çima herdem li bara nirxandinên mînaka av û hewayê nebaweriyek têkildar heye?
9. Rapora panela NY bo av û hewayê ya ku di sala 2007`an da hat weşandin, ev encam diyar bû ku beşa mezin a germbûna erdê di 50 salên borî da renge bi destê mirov pêk hatibe. Çima ev yek bûye sebaba sernivîs û nîqaşên germ û berfireh?
10. Ev panela NY bo av û hewayê piştî ku di sala 2007`an da weşiya, rastî rexneyan hat. Bingeha rexneyan çî bû û gelo ew bêyalî bû?

Erk û karên xurtbûyî:

1. Çima anîna belgeyan, dijberbûn û eşkerekirina bo lêkolînên av û hewayê girîng in?
2. Lêkolîner çawan dikarin kar bikin sa ku hokara nebaweriyê di mînakên av û hewayê da kêmbibe?
3. Wateya têgeha ``agahiyên azmûnkî`` çi ye? Av û hewayê wekî mînak bi kar bînin?
4. Hevkariya navneteweyî ku bingeha raporên NY yê av û hewayê ne biwesifînin.